**NATO Û SWÊD**

**Amîda Kurd**

Axa Ûqreynayê di 2014'an de ji aliyê Ûrisya ve hate dagirkirin, Qirim ji aliyê Ûrisya ve hate standin. Ûqreynayê ji bo axa xwe biparêze ji 2016'an ve endamtiya NATO'yê xist rojeva xwe. Ûrisyayê di 2021'ê de wekî ku berê axa Ûqreynayê rizgar nekiribe û armancek wê ya pirtir dagirkirina Ûqreynayê tune be, nêta endamtiya NATO ya Ûqreynayê kir hincet û li hember Ûqreynayê ket amadehiyek mezin a leşkerî. Digel hemû hewildanên dewletên cîhanê Ûrisya got tu niyeta me ya dagirkirina Ûqreynayê tune, lê ji 100 hezarî pirtir leşker kişand ser sînorê Ûqreynayê û hindurê Belarûsê. Di 22.02.2022'an de, di salvegera Împeretoriya Ûrisya de Pûtîn biryara dagirkirina Ûqreynayê li ber qamerayan aşkere kir, lê wekî êrîşa 1853'a Qirimê dîsa ev wekî "operasyon" bi nav kir û got "ev ne şer e". Li aliyê din Pûtin di vê daxuyaniya xwe de sînorê Ûrisyayê bi gotina "tenê Ûrisya dikare sînorê Ûrisyayê belî bike" anî ziman û nîşan da ku ew serxwebûna Ûqreynayê nas nake. Dema mirov di vê çarçeveyê de li mijarê dinihêre, tê famkirin ku mijar û sedem ne endamtiya NATO ya Ûqreynayê ye, lê bernameyek Serokê Ûrisya Pûtîn heye. NATO çi ye, çawa derket holê, serdana Swêd û Fînê ya endamtiya NATO tê çi wateyê, Turkî di vê pêvajoyê de çima wekî ne endamê NATO be tevdigere, çima pirtir bi Ûrisya re di diyalogê de ye, Kurd di ku dera vê qonjunkturê de ne, em dê li bersiva van pirsan bigerin.

## NATO

Rêxistina Peymana Atlantîka Bakur, (Bi Îngilîzî: North Atlantic Treaty Organization, NATO; Bi Frensî: Organisation du traité de l'Atlantique nord, OTAN) di 4'ê Avrêla 1949'an de ji aliyê 12 welatan ve bi îmzekirina Peymana Atlantîka Bakur hat avakirin, di demên cuda de 18 welatên din beşdar bûne, tifaqeke leşkerî ye.

Endamên rêxistinê li hember êrîşên ji derve parastina hevpar dikin. Navenda NATO'yê li Brukselê, paytexta Belçîqa ye, ku ew yek ji 30 endamên NATO ye. 21 welat di xebata "Hevkariya Ji Bo Aştiyê" ya NATO de cih digirin. 15 welat jî di nav bernameya diyaloga sazûmanî de cih digirin. Lêçûna hemû endamên NATO ji %70'yê lêçûna parastinê ya hemû cîhanê ye. (1)  Endamên NATO divê salê bi qasî %2'ê hatina welat razemeniya parastinê bikin.(2)




Piştî Şerên Napolyon (1815) Ewropayê bi navê aqilek derxist ku kes nikaribe bi serê xwe êrîşî dewleteke din a Ewropa bike û bi navê "Concert Of European" peymanek hate çêkirin, ji 1815'an heta 1914'an bi vê peymanê Ewropa di rihetiyê de ma. Împaratoriya Osmanî jî bi saya vê peymanê xwe ji êrîên Ûrisya parast.

Piştre Şerên Hîtler ji bo cîhanê bû aqilekî mezin ku welat bikaribin xwe li dijî êrîşên derve biparêzin.
Bi avabûna Sovyetê re êdî xetere ne tenê êrîşeke mûhtemel a dewletekê bû, şerekî mûhtemel ê Qomunîzmê û Qapîtalîzmê hebû. Loma jî Cîhana Rojava wekî encama tecrûbeya Concert Of European (1815-1914) NATO ava bike. Heke em nirxandinên teng ên îdeolojîk bidin aliyekî, em dikarin bêjin NATO nehiştiye di navbera 1949-1991'ê de şerekî îdeolojîk ê gerdûnî derkeve holê.

NATO heta Şerê Qoreyê (1950-1953) Hevkariyek Siyasî bû û di dema Şerê Qoreyê de wekî parastina îdeolojîk li hember Qomunîzmê ket tevgerê, avahiyek hevgirtî ya leşkerî çêbû.

Di 1955'an de dema Peymana Varşowa ava bû, di navbera dewletên Qomunîst û Qapîtalîst de pêvajoya Şerê Cemidandî jî dest pê kir. Şerek hebû, lê ev şer hatibû cemidandin, hatibû sarkirin, hatibû rawestandin.

Di wan salan de gelek nîqaş di hindurê NATO de derketin, wekî gumana ku DYE dê bikaribe Ewropayê ji Sovyetê biparêze an na? Frensa di 1966'an de ji baskê leşkerî yê NATO vekişiya. Bi hilewşîna Dîwarê Berlînê (1989) re û bi hilweşîna Sovyetê re (1991) ev nîqaş pirtir bûn. Dîsa jî NATO'yê di salên 1999-2004'an de hinek welatên berê endamê Peymana Varşowa bûn, kir endamê xwe.
NATO cara yekem di salên 1992-1995'an de li Bosna û Hersekê, piştre di 1999'an de li Yûgoslavyayê midaxaleyên leşkerî kir. Komara Turkî jî wekî endamekî NATO'yê li hember Şerê Rizgariya Kurdistanê di 1984-2014'an de ji NATO'yê destekek mezin stand, Serokê Şerê Tevgera Rizgariya Kurdistanê birêz A. Öcalan bi hevkariya dewletên NATO hate revandin û radestî dewleta dagirker a Tirk kirin. Di Şerê li hember mêtingeriya Îran, Turkî, Sûrî û Îraqê ya li Kurdistanê NATO'yê pozîsyonek gelek şaş girt, ev yek jî bû sedema ku şerê azadkirina Kurdistanê ji destê her çar mêtingeran wekî şerekî îdeolojîk were dîtin. Gelek rêxistinên çep li Kurdistanê rizgariya welat dan aliyekî û şerê li dijî Qapîtalîzmê ji ber vê sedemê pirtir kir parek ji propaganda û ajîtasyona xwe. Lê di rastiya xwe de pirsgirêka Gelê Kurd a sereke ji mêtingehiyê rizgarî ye.

**POZÎSYONA TURKÎ YA DI NATO DE**
Împaratoriya Osmanî ku xeyal dikir Wiyanayê dagir bike, dema lawaz ket, ji bo xwe ji êrîşen Ûrisyayê biparêze, bû endamê peymana Concert Of Europen. Ji 1853'an û pê ve Ûrisya dest bi hewildana belavkirina Împeretoriya Osmanî kir. Di navbera Ûrisya û Osmaniyan de Şerê Qirimê (1853-1856) di vê demê de derket. Qraliyeta Yekgirtî, Frensa û Piyemonte-Sardinya di vî şerî de bûn hevalbendên Osmaniyan û Ûrisya ji cihên standibû hat derxistin. Di 1877-1878'an de şerekî din di navbera Osmaniyan û Ûrisya de derket, di vî şerî de Ûrisya heta Stenbolê çû, lê dîsa bi saya Concert Of Europen Osmaniyan axa xwe parastin.

Loma jî ji Turkî xwe li hember Şerê Rizgariya Kurdistanê biparêze endamtiya NATO û desteka dewletên Ewropa û Cîhana Rojava pir girîng bû.

Ji xwe ev pêvajo heta 2014'an wiha hatiye û di 2014'an de dema endamên NATO di Şerê Kobanê de nehişt DAIŞ û dewletên li pişta wê tevkujiyek mezin bînin serê Kurdan, hemû têkiliyên Turkî û endamên NATO xira bûn û têkiliyên Turkî û Cîhana Rojhilat derketin pêş. Turkî êdî wekî dagirkerên din ên Kurdistanê (Îran, Îraq û Sûrî) li milê Ûrisyayê pozîsyona

xwe digire û endamên NATO'yê bi piştgiriya têkoşîna azadiyê ya Kurdan tawanbar dike û têkoşîna azadiyê ya Kurdan wekî rêxistinên terorîst bi nav dike.

Ji bo Turkî, Îran, Îraq û Sûrî mijara mêtingerî û dagirkeriya li Kurdistanê mijarek qederî ye û di pêşiya her tiştî de ye. Têkiliyên van çar dewletan bi dinyayê re li gor desteka di vî warî de ye. Cîhana Rojava çi qasî azadî û serxwebûna netewa Kurd wekî mafekî însanî û netewî bibîne, dê têkiliyên wan bi van çar dewletan re jî ew qasî xira bibe. Het Kurdistan ji dagirkeriyê rizgar nebe jî ev pirsgirêk ji vê qrîzê dernakeve.

**ENDAMTIYA NATOYA YA SWÊD Û FÎNÊ**

Heke em nirxandina jorîn rast qebûl bikin, du pîvanên bingehîn derdikevin holê.

**Yek:** Heke têkiliyên Turkî û endamên NATO ji Şerê Kobanê û vir ve xira bûbe, heke têkiliyên Ûrisya û Turkî jî ji wê demê ve xurtir bûbe, nexwe Turkî ji ber têkiliyên xwe yên bi Ûrisya re nikare endamtiya Swêd û Fînê erê bike. Divê li gor têkiliyên xwe û Ûrisya tevbigere. Ji ber ku li hember Kurdan êdî nikare endamên NATO bi kar bîne, berjewendiyên xwe li aliyê Cîhana Rojhilat dibîne.

**Du:** Dewleta Tirk dema dibêje "em dê endamtiya Fînê tenê erê bikin" divê di vê çarçoveyê de wekî gavek teqtîq a Cîhana Rojhilat were famkirin. Ûrisya di şerên xwe yên dîrokî de timî hem dikeve şer, hem jî êrîşa xwe û dagirkeriya xwe wekî "şer" bi nav nake, navekî din lêdike. Di vir de jî em dibînin ku dixwaze Swêd û Fîndê cuda cuda dayne hemberî xwe û bi wan re yeka yek şer bike. Xuya ye her du dewlet jî vê dibînin û vala derdixin.

**DAGIRKIRIN Û PARASTINA ÛQREYNAYÊ**



Di nirxandina pêvajoyê de bîr û dîrok bingeh in. Ji be ku pirsgirêka herî mezin a civakê û mirovahiyê teorîk e. Cîhan Şerê Ûrisya û Ûqreynayê di çarçoveya salên 2016-2022'an de dibîne, loma jî gelek çepgir mijarê di çarçoveya **"Ûqreyna hat lîstika NATO"** de dinirxînin. Lê dema mirov li daxuyaniyên Serokê Ûrisya Pûtînî dinihêre, mirov dibîne ku Ûrisya ne tenê doza parçeyek axa Ûqreynayê dike. Ji xwe di 2014'an de bi dagirkirina Qirimê nehat ser, yanî ranewestiya. Niha jî Ûrisya niyeta xwe ya dagirkirina hemû axa Gelên Slav venaşêre. Ev zirt û fot nîşan didin ku Ûrisyayê xwe tenê ji bo dagirkirina Ûqreynayê amade nekiriye, dûmahîka wê heye. Nexwe divê Cîhana Rojava û NATO jî ev niyet û bername dîtibe û amadehiya xwe li gor vê yekê kiribe. Têkbirina bernameyek wiha jî encax bi parastinek saxlem a Ûqreynayê mimkûn bû. Parastina ku îro Cîhana Rojava li Ûqreynayê dike, desteka ku bi awayekî xurt dide Ûqreynayê jî vê fikrê destek dike.

- **Lê gelo hêza Ûrisya ji bo dagirkirina ev qas ax heye?**
- Cîhana Rojava ji bo parastina Ûqreynayê şaşiyek bikira jî paşê dê di gavek din a Ûrisya de têketa tevgerê û dê hêzek Ûrisya bi tena serê xwe nikaribe pê, derketa holê.
- Wê demê divê di bernameya Ûrisya de jî wekî bernameya parastinê ya dewletên Cîhana Rojava bernameyek Ûrisya ya dewletên êrîşkar hebe; divê Qoreya Bakur, Çîn û hinek dewletên din di vê bernameyê de bin.

- **Heke bernameyek wisa ya Ûrisya hebe, ma diviya me ji gelek aliyan ve nîşaneyên vê bernameyê nedîta?**

Heke bernameyek wisa hebe, em dê tevger û helwesta Turkî jî bikaribin fam bikin.

Di 2021'ê de dema MI6 û CIA rapor diweşandin, ku Ûrisya amadehiya dagirkirina Ûqreynayê dike, Qesra Spî û hikûmetên hemû dewletên Ewropa digotin "heke Ûqreyna were dagirkirin em dê nekevin şer". Serokê DYE'yê Biden got "Ûqreyna ne endamê NATO ye, ku NATO ji bo parastina wê madeya 5'mîn têxe meriyetê".

Îro ji ber ku DYE, Qraliyeta Yekgirtî û hemû Cîhana Rojava parastina Ûqreynayê destek dikin û nehiştin Ûrisya bikaribe Ûqreynayê dagir bike, bi taybetî çepgir dibêjin **"DYE û Qraliyeta Yekbûyî Ûrisya li Ûqreynayê kişandin feqê, xistin çiravê"**. Em hemû çepgir in. Sosyalîzmê yekemîn şoreşa xwe di 1917'an bi hilweşandina Ûrisya Çar pêk anî û ji wê rojê heta niha çepgiran nihêrîna xwe ya li Cîhana Rojava di berçavka Moskovayê re nirxand.

Heke bernameyek Ûrisya ya dagirkirina Ûqreynayê ji berê ve hebe û heke raporên 2021'ê yên MI6 û CIA rast bin, nexwe divê bernameyek bersiv û helwesta DYE, Qraliyeta Yekgirtî, dewletên Ewropa û Îsqandînav jî hebe. Heta divê Swêd û Fîn jî heta derekê parçeyê vê helwestê bin.

Li gor vê yekê fikra herî rast çi bû? Pirsên li ser maseya serokên dewletan belî ne:

- Gelo divê Ûqreyna wekî endamekî NATO bihata parastin?
- Gelo divê dîregê qelê li ku bûya? Yanî dema Ûrisya ket Ûqreyna diviya hemû endamên NATO bersiva vî şerî bida?
- Heke bi Ûrisya re têketina şer dê bikaribûna şer di çarçoveyekê de bihêlin, an dê Qoreya Bakur, Çîn û hinek dewletên din jî li milê Ûrisya têketina şer û ev şer bibuya Şerê Sêyem ê Cîhanê.

Xuya ye Cîhana Rojava dîregê qelê li Polonyaya endamê NATO danî. Heke Ûrisya êrîşî Polonya nekira dê NATO beşdarî şer nebûya. Lê dê hemû alîkarî jî di ser Polonya re têketa Ûqreynayê.

Heke nirxandinek wisa hatibe kirin, nexwe Cîhana Rojava wekî Cîhana Rojhilat îdia dike feq li Ûqreyna daneynîne û Ûrisya nekişandine çiravê.


Heke êrîşek hebe û hûn bernameya xwe ya parastinê veşêrin û reng nedin, ev pir asayî ye û ehlaqî ye. Lê heke hûn hem êrîş bikin, hem jî îdia bikin ku aliyê hember ji bo we têxe şer hûn tehrîq kirine û hûn wekî zarokekî bixapîne xapandine, ev ne ehlaqî ye.

Lê xuya ye pirsgirêkek din jî li ber Cîhana Rojava hebûye; Turkî û hinek dewletên din ên endamên NATO digel ku endam bûn jî, dema şerek bi Ûrisya re derket dê bi NATO re tevnegeriyana. Loma jî xuya ye ku Qraliyeta Yekgirtî, Polonya û Ûqreynayê ji dervê NATO'yê yekîtiyek parastina leşkerî ava kirine. Îro jî em dibînin heke hesabek di ser NATO re hatibûya kirin dê şaş derketa, Turkî beşdarî sepanekê jî li dijî dagirkeriya Ûrisya nabe û di vê demê de bazirganiya xwe ya bi Ûrisya re derxist du qatan. Heta ji bo Turkî di vê helwesta xwe de bikaribe bi biryar be em dibînin ku Ûrisya destekek mezin a herke (energy) û aborî dide Turkî.

Amûrên Hewayî yên Bêmirov (AHB) yên Turkî ku firotin Ûqreynayê di vî şerî de ji aliyê Ûqreyna û endamên NATO ve hatin pesindan, lê nêzî hemûyan ji aliyê Ûrisya ve bi hêsanî hatin xistin û wekî pesnê wan hate dayin serkeftinek wan nehat dîtin. Ûrisya di vê mijarê de jî niyet fam kir û aşkere got “AHB’yên Turkî daye Ûqreyna dê têkiliya me xira neke”. Lê heman Ûrisyayê ji bo çekên dewletên din didin Ûqreynayê cîhan bi bikaranîna çekên nukleer jî tehdîd kir. Ev helwest hemû nîşan didin ku yekîtiya parastina leşkerî ya Qraliyeta Yekgirtî, Polonya û Ûqreynayê ji ber helwesta endamên NATO hatiye avakirin.

**ROLA TURKÎ DI QONJUKTURA ŞERÊ ÛRISYA Û ÛQREYNA DE**

Gelo çima Turkî wekî endamekî NATO di parastina Ûqreynayê de dualî tevgeriya û di pêvajoyek wiha de têkiliya xwe ya aborî û leşkerî bi Ûrisya re qut nekir? Berevajî wê, Turkî, Ûrisya, Îran û Sûrî çima di vê pêvajoyê de çar dewletên herî pir hevdîtin kirine.




Nexşe û Xebatên Dr. Michael Izady (3)

Turkî, Îran, Sûrî û Îraqê di Şerê Yekem ê Cîhanê de Kurdistan di nav xwe de par kirin. Kurdistana ku ji serê mîladê ve ji aliyê Asûr, Roma, Bîzans, Pers û Ereban ve hatibû dagirkirin di salên 1912-21’ê de ji aliyê Tirk, Ereb û Farisên Misliman ve hatin manîpulekirin, wekî Kurd birayê wan ê hemolî bin nîşan dan. Kurdan loma wekî Ereb, Faris, Filistînî û gelên din şerê rizgariya Kurdistanê li hember Osmaniyan neda, bi Osmaniyan re li dijî dewletên Rojava û Ûrisya şer kirin.

Her çar dewletên dagirkerên Kurdistanê jî di rastiya xwe de dewletên Cîhana Rojhilat in. Lê Tirkan ji bo dewleteke serbixwe bi Îngilîzan re li hev kirin, ku wê demê Sovyet nû ava bibû, xwe wekî dewleteke tampon di navbera Sovyet û Cîhana Rojava de lanse kirin. Kurdan jî di

şerê belavkirina Osmaniyan de destek dabû Osmaniyan, loma jî tiştekî kesî ji bo Kurdan bikira tunebû.

Her çi qas hevkariya Turkî, Îran, Sûrî û Îraqê di dagirkeriya Kurdistanê de yek be jî, Turkî di 1952'an de bû endamê NATO û şerê xwe yê li dijî rizgariya Kurdistanê kir parçeyekî parastina NATO'yê. Di vî warî de her cure desteka çek, perwerde, birêxistinkirin û aborî stand.

Sovyet û dewletên Sosyalîst ên Cîhana Rojava tu carî destek nedan şerê rizgarkirina Kurdistanê. Lê Partiya Karkerên Kudistan (PKK) ku di 1984'an de ji bo Kurdistana Azad û Serbixwe dest bi şerê rizgariya netewî kir, derfet dît ku li Libanê baregehekê ava bike. Libnan, Sûrî û Îraq bi têkiliyên xwe yên bi Ûrisya re tên naskirin.

Tevgera Azadî (1925) ku yekem partiya Kurdan e, duyem partiya Kudan Xoybûn (1921), ku tê wateya serxwebûnê, sêyem partiya Kurdan PDK (1946) û YNK (1975) ku Serokên her duyan jî avakarên Kurdistana Îraqa Federal in, PKK (1978) ku ji 1984'an heta îro şerê çekdarî yê gerîla dimeşîne hemû wekî partiyên çepgir hatin avakirin. Kurdan NATO û Cîhana Rojava wekî tawanbarê parçebûna Kurdistanê dîtin û Sosyalîzm jî wekî riya birêxistin û azadkirina Kudistanê dîtin.

Vê rewşê heta şerê 2014'an ê Kobanê dom kir û heke ev pêvajo rast neyê famkirin, dê bandora qonjunkturê li ser nirxandin û nihêrîna 100 salên dawî neyê dîtin.


Ji ber Turkî NATO li dijî Şerê Rizgariya Netewî yê Kurdistanê bi kar anî û ji ber ku îstixbarata Ûrisya jî li Rojhilata Navîn hewl da hemû rêxistinên çepgir li dijî Cîhana Rojava wekî wekîl (proxy) bi kar bîne nihêrîna Gelê Kurd û Cîhana Rojava her çû dûrî hev ket. Ev pêvajo ji aliyê mîsyoneran ve wisa hat bikaranîn ku gelek rêxistinên çepgir ên Kurd azadî û serxwebûna Kurdistanê danîn aliyekî û armancên îdeolojîk di ser her tiştî re girtin.

Ya rast Kurdên 1912-21 ku Împaratoriya Osmanî bi fikrên olî li dijî Cîhana Rojava parastin jî heman şaşî kirine û mirov dikare bêje ku çepgir û rasgirên Kurd ku aqilê xwe yê netewî di pêvajoya dagirkirina sed salan de winda kirine, pêdiviyên xwe yên sereke wekî azadî û serxwebûnê jî winda kirine, loma ol û îdeolojî di mijarên qedera welatekî de ketine pêşiya her tiştî.

Endamên NATO jî di nirxandina Şerê Rizgariya Netewî ya Kurdistanê de (1984-2014) ketin heman şaşiyê û şerê Kurdan wekî şerê li dijî Qapîtalîzmê û pergala Cîhana Rojava nirxandin. Aşkere ye, ji bo ev mijar wisa were famkirin jî gelek mîsyonerên dagirkeran û îstixbaratên ku çepgiran wekî hêzên wekîl (proxy) bi kar dianîn bûn sedema gelek şaşiyan. Mînak li ser navê Kurdan şerê xwe timî wekî şerekî li dijî Qapîtalîzmê nîşan dan. Lê do Sovyet, îro jî Çîn xwe ji gotinên bi vî rengî dûr digire, ji ber ku daxuyaniyek wisa dê dijberên wan jî li dijî wan organîze, qanalîze û qonsolîde bike.

Serokê PKK'ê A. Öcalan ji destpêka salên 1990'î ve ji bo PKK û Şerê Rizgariya Netewî ya Kurdistanê ji aliyê bloqên cîhanê ve li dijî aliyekî wekî hêzek wekîl neyê dîtin gelek guhartin kir. Riya lihevkirina bi Turkî re vekir (1993) û Das û Çakûç ji ala PKK'ê derxist (1995). Turkî endamê NATO bû û lihevkirina Kurdan û Turkî ya endamê NATO ne li gor armanca Bloqa Rojhilat bû. Vê pêvajoyê kevirê riya ku PKK û Öcalan ji Libnan û Sûrî bên derxistin (1998) danî, ku wê demê Pûtîn Serokê Serwîsa Ewlekariya Federal (FSB) e. Bi îhtîmaleke mezin

Öcalan û fikrên xwe nehatin ecibandin û bi Turkî re li ser wî bazarek hat kirin, wisa ji Rojhilata Navîn hat derxistin, revandin û radestî Turkî hat kirin. Di berdêla vê de jî CIA û FSB'ê li ser çi li hev kirine, nayê zanîn. Di 15.02.1999'an de piştî operasyona li dijî Öcalan bi ser ket, Pûtîn jî di 09.8.1999'an de bû Serokê Ûrisya. Pûtin mirovekî wisa ye ku ji wê demê heta niha ji serê Ûrisya daneketiye û di hemû polîtîqayên netewî û navnetewî de meqamê tekane ye. Loma jî derxistina Öcalan ji Rojhilata Navîn, paşê ji Ûrisya jî derxistina wî miheqeq ji aliyê wî ve hatiye nirxandin û sedema wê nêzîkatiya Mosqovayê ya li rêxistinên çepgir e, ku dixwaze hemû wekî wekîlên Ûrisya tevbigerin.




2002 turkiska parlamentsval


Partiya Serokdewletê Turkî R.T. Erdoğan jî li heman demê rast tê, ku AKP di 14.08.2001'ê de ava bû. Serokê Şerê Rizgariya Netewî ya Kurdistanê A. Öcalan dema Bülent Ecevit Serokwezîrê Turkî bû hat revandin û girtin (1999), lê partiya Erdoğanî di hilbijartina parlamentoyê ya 03.11.2002'an de bû partiya yekem. Erdoğan û Pûtîn bi hev re, piştî heman bûyerê hatine serê dewleta xwe û heta îro daneketine.

**Gelo wekî din çi nîşaneyên wan hene?**

Partiya Erdoğanî di 2002'an de bû îqtîdar, lê vî serokê jêhatî nikaribû bibûya parlamenter, qedexeya wî ya siyasî hebû. Li şûna wî avakarekî AKP'ê Abdullah Gül bû Serokwezîrê Turkî. **Heta wê demê Turkî dewletek Kemalîst bû.** Kemalîzm îdeolojiya avakarê Komara Turkî M.Kemal Atatürk e, ku 6 pîvanên wê hene: Dewletparêzî, Komarparêzî, Neteweperestî, Gelparêzî, Şoreşparêzî û Laîkî. Dewleta Kemalîst a Turkî xwe pirtir disipat NATO'yê. Ji bo Erdoğan newe serê Turkî her astengî çêdikirin. Ev bi piranî ne astengiyên demoqratîk bûn. Kemalîzm jî bi qasî Rejima Erdoğan a îro antî-demoqratîk bû.

Erdoğan ji bo vê pêvajoya antî-demoqratîk vala derxe pêşî li şûna xwe cîgirê xwe Abdulah Gül kir Serokwezîrê Turkî. Piştî partiya wî hat îqtîdarê li Kurdistana dagirkirî, li bajarê Sêrtê

hilbijartin betal kir û ji bo ew jî bikaribe li wir bibe berendamê parlamenteriyê hemû amadehî kir. Li Sêrtê partiya yekem di hilbijartina 2002'an de partiya Kurdan DEHAP bû, lê derfet neda ku DEHAP têkeve hilbijartinê û di vê hilbijartinê de xwe bi riyên antî-demoqratîk kir parlamenter. Êdî dikaribû bibûya Serokwezîrê Turkî.



Piştre Abdullah Gül ji Serokwezîriyê daxist (14.03.2003) û ew bû Serokwezîr. Di 2007'an de ji ber ku Kemalîst li dijî Serokomariya wî bûn, li şûna xwe Abdullah Gül kir Serokomar (28.08.2007) û di 28.08.2014'an de Erdoğanî piştî hemû yasa li gor xwe guhart, bû Serokomarê Turkî. **Pêvajoya Erdoğanî û Gül çi qasî dişibe pêvajoya Pûtîn û Medyedev, ne wisa?** Gelo dibe ku têkiliyek her du pêvajoyan bi hev re hebe. Ji ber ku pêwendiya navbera Pûtîn û gelek serokên hinek dewletan bi vî rengî hinekî li ser bingeha mîsyonerî dimeşe. Wekî Serokê Belarûsê, li gor hinekan Trump bi xwe jî yek ji wan kesan e.

Erdoğan û Gül berî AKP'ê ava bikin endamê partiya RP'ê bûn. Serokê partiyê Necmettin Erbakan bû. Ew wekî mirovekî oldar dihat naskirin. Di Îslamê de nimêj rojê 5 caran tê kirin, lê li gor dîtyaran Erbakanî ji bo oldariya xwe nîşanî hemwelatiyan bide di rojekê de biçûya çend cihan, ew qas car nimêj dikir, da ku mirov bibin dîtyarê oldariya wî û bandorekê li ser wan bike. Kemalîstan jî ew wekî dijminê pergala laîk didan nîşan.

Ya rast em dizanin Îran û Ûrisya  di warê rêxistin û serokên mîsyoner de jîr û jêhatî ne. Îran di Îslamê de mezhebê Şîa ye, li Libnanê Hizbilahê birêxistin dike ku ew jî Şîa ye, lê li Kurdistanê li dijî PKK'ê dîsa bi navê Hizbilah rêxistinek ji Kurdên Sunî ava kiriye. Li Rojhilata Navîn gelek rêxistinên olî û cîhadîst wekî wekîl (proxy) bi kar tîne. Ûrisya jî li cîhanê gelek rêxistinên çepgir, partî û serokan bi heman awayî bi kar tîne. Lê têkiliyek wan bi RP'ê re hebû, an na?

Piştî PKK di 1978'an de ava bû bernameya çepgirên Tirk û Kurd ên wekîl (proxy) red kir, komek ji nav PDK'ê bi hinceta ku rêberên PDK'ê kal û pîr in, bi navê KUK ji PDK'ê veqetiyan û rasterast bi çekan êrîşî PKK'ê kirin. Heman pêvajoyê em di RP'yê de jî dibînin. Abdullah Gül di 14'ê Gulana 2000'an de li ser navê Koma Nûparêzan bû berendamê serokatiya RP'yê û navê "Gelêrîparêz" li kal û pîrên RP'ê kir. Lê ev pêşbazî di qongreyê de winda kir û piştî Erdoğan ji girtîgehê derket pê re AKP ava kir. Xuya ye dê ajandaya xwe di RP'ê de bi cih bianîna lê bi ser neketin. Li aliyê din lîsteya avakarên AKP'ê pir balkêş e. Mirov dikare jê re bêje ANAP a duyemîn jî. AKP ne partiyek îdeolojîk e, berhevka qadroyên partiyên têkçûyî ye.



Gelo tiliya Îranê di nav Turkî de hew Hizbilaha Kurd bû, an di nav partiyên Tirk de jî tiliyek wê hebû? Ev nayê zanîn. Sêgoşe ji aliyê Serokê MİT'ê Hakan Fîdan ve temam dibe. Rojnameya Elman **Der Spiegel** li ser têkliyên wî Îranê pelgeyên **Snowden** weşand (2014).

Heke ev hemû rast bin, gelo me dê li Turkî hinek bûyerên li gor armanca Pûtîn û li dijî NATO û Cîhana Rojava nedîta? Ku mirov ji 1999'an heta 2023'an li pêvajoya Turkî binihêre, miro dê bibîne ku li Turkî pêşî Kemalîst û artêşa Tirk a di qontrola Kemalîstan û NATO de hatiye têkbirin, generalên wan hîn jî di girtîgehan de ne. Piştre jî Civata Fethulahiyan ku wekî projeya Îslamiyên Nerm a DYE'yê dihat pênasekirin, bi tevahî hatin belavkirin, bi deh hezaran kesên di dibistanên wan de xwendine ji karên dewletê hatin avêtin.

Ji bo Erdoğan artêşa Tirk ji qontrola NATO derxe û bike artêşek hevkarê Mosqovayê divê di nav artêşa Tirk de berê qadroyên Erdoğan û partiya wî AKP'ê hebin, lê me li jor got AKP ne partiyek îdeolojîk e, nexwe nabe ku qadroyên AKP'ê di artêşa Tirk de hebe. Wê demê, dema qadroyên NATO têk birin, şûna wan çawa tijî kirin?




Bahçeli & Erdoğan & Nexşeya Tûran

Di vir de jî em qoziyek din a Erdoğanî dibînin, MHP û Devlet Bahçelî. MHP ne partiyek Kemalîst e, ew Tûranîst e. Wekî xeyalên Pûtîn ên Emperyal, xeyalên Tûranîstan jî ên Emperyal hene. Pûtîn di warê xeyalên emperyal de bi Çîn, Îran, Turkî û heta Hindê re di nav têkiliyan de ye. Pûtîn di berdêla hevkariya li dijî Cîhana Rojava de xeyalên emperyal ên van dewletan hem deste dike, hem jî çarçoveya wê ew belî dike. Nexşeya ku Bahçelî û Erdoğanî nîşanî gelê nijadperest ê Tirk dide helbet ne nexşeya li ser maseya Pûtîn e, lê ev nexşe ji bo gelê Tirk li dora her du serokan qonsolîde bike hatiye amadekirin û qet bandorek xirab li têkiliyên navbera Turkî û Ûrisya nake, berevajî wê, Pûtîn wekî di mijara AHB'yên Turkî dide Ûqreynayê de, tiştên sembolîk û bingehîn qet têkilhev nake.

Di nav Artêşa Çekdar a Tirk (TSK) de qadroyên sê hêzan hebûn:

- Kemalîst (Ergenekon)

- Fethulahî (Xizmet)
- Tûranîst (Ötüken)

Her çi qas her kes hevkariya MHP û AKP'ê ji darbeya 15.07. 2016'an û vir ve dibîne jî, di bingeha xwe de darbeyên siyasî yên di 2005-2013'an de li dijî Kemalîstan hatin kirin hemû ji aliyê MHP (Ötüken), Fethulahî (Xizmet) û AKP'ê ve hatin kirin. Paşê MHP û AKP'ê Fethulahî û Kemelîst di darbeya leşkerî ya 15.07.2016'an de bi tevahî tune kirin. Êdî qadroyên NATO'yê bi tevahî hatin avêtin.

**BANDORA KURDISTANÊ LI SER QONJUKTURÊ**

Di 16'ê Adara 2011'an de li Sûrî şerekî navxweyî dest pê kir. Bi tevlihevbûna Sûrî re Îranê jî ji KCK'ê daxwaz kir ku ji hinek cihên Herêma Parastina Medya derkevin û qorîdorekê ji Îranê heta Sûrî j wan re vekin. Piştî KCK'ê ev red kir, êrîşeke xurt li dijî HPG'ê (Hêzên Apoîst ên li Başûr û Bakura Kurdistanê) da destpêkirin. Di saetekê de 80 fuze li herêma Qendîlê ketin. Gelek sivîl şehîd ketin, pez û ajalên dundiyan zirar dîtin, şervanekî HPG'ê şehîd ket. KCK'ê jî hinek êrîş li dijî Îranê kir û Îranê dît ku şer berfireh bibe dê KCK Kurdên di bin dagirkeriya Îran û Sûrî de jî beşdarî berxwedanên çalak bike û agirbest çêkirin.

Artêşa Azad li Turkî di bin navê "Perwerde û Hilgirtin" de hatibû amadekirin. Lê bandora KCK'ê (Pergala Rêveberiyê ya hemû partiyên Apoîst) li ser Kurdan hebû û nehişt ku Kurdên bajarên di bin dagirkeriya Sûrî de beşdarî şerê navxweyî bibin. Argumanên PYD'ê (Partiya Apoîst a parçeyê Rojavayê Kurdistanê) aşkere bûn:

- Kesî di vî şerî de cih nedaye Kurdan
- Bloqa Rojhilat û Bloqa Rojava li Sûrî şer dikin
- Serhildana li dijî Rejima Esed bê serok, bê partî, bê bername ye û ne pêbawer e
- Rejima Sûrî û hevkarên wê Îran û Ûrisya dê bi tundî û şid midaxale bikin û heke em jî beşdar bibin em dê bên kuştin, kes jî li pey me tune.

Partî û Hêzên Apoîst li aliyekî têkiliya Îranê ya rasterast bi Sûrî re dibirîn, li aliyê din ji ber ku Hêzên Navnetewî di Sûrî de ew nedihesibandin, Riya Sêyem îlan dikirin û hêza xwe dûrî her du bloqan birêxistin dikir.

Partiya Demoqrata Kurdistanê (PDK) û Serokê AKP'ê Erdoğanî di vê pêvajoyê de Apoîst wekî hevalbendên Rejima Esed lanse kirin. Nivîskar û hunermendên ji aliyan wan ve dihatin fînansekirin, Apoîst wekî parêzvanên Rejima Esed û dijminê berjewendiyên Kurdan tawanbar kirin.

Di 19.07.2011'an de, ku Rejima Esed lawaz ket û gelek bajar ji destên Rejima Esed çûn, YPG'ê (Hêzên Apoîst ên parçeyê Rojavayê Kurdistanê) bi biryara PYD'ê (Partiya Apoîst a parçeyê Rojavayê Kurdistanê) dest danî ser gelek bajarên Rojavayê Kurdistanê û ji hêzên Rejima Esed xwest ku di 24 saetan de baregehên xwe biterikînin.

Ji 16'ê Adara 2011'an heta 2014'an Ûrisya bi awayekî çalak beşdarî şerê navxweyî yê Sûrî nebû, li qadê Îran hebû. Ûriyayê piştî di 2014'an de Qirim ji Ûqreyna tand û jê re serifî, di 2015'an de daket qada Sûrî. Loma jî dema YPG'ê dest danî ser bajarên Kurdan ên Rojava, ji ber rewşa qonjukturê Îranê nexwest şer li ber xwe pahn bike, Rejima Esed jî sertewandina Kurdan hişt salên pêşiya xwe.

El Qaîdeya ku li Îraqê bi salan êrîş dibir ser hêzên Emerîqî û Hikûmeta ku bi Emerîqa re hevkarî dikir, ji aliyê Îranê ve dihat destekirin. Îran di vî warî de jîr e. Di vê pêvajoyê de ji nav El Qadîdeyê bi navê DAIŞ'ê rêxistinek nû ava kir û bera nav Sûrî û Îraqê da. DAIŞ'ê di demek kurt de Artêşa Azad tune kir. Îranê carek din ji bo qorîdora navbera Îran û Sûrî veke hewl da û vê carê DAIŞ berda ser devê deriyê vê qorîdorê, ku ew der Şingal bû. Mixabin tevkujiyek mezin çêbû, bi midaxaleya YPG'ê ya ji Rojavayê Kurdistanê bi deh hezaran Kurdên Êzdî rizgar bûn. Ji wê demê û heta niha Îran hewl dide Şingalê bixe destê hêzên wekîlê xwe û îro Şingal di bin tehdîda hêzên Heşd el Şabî û Tirkmenên hevkarên Îranê de ye.

El Qaîde li dijî hêzên Apoît têk çû. Artêşa Azad a ku qaşo dê Rejima Esed wergeranda, ket qontrola Erdoğanî êrîşî Kurdan kir, ji bo ji Sûrî veneqetin û nebin hêzek azad û serbixwe. Paşê El Nusra ya ji El Qadîde veqetiya êrîşî Kurdan kirin. Herî dawî jî DAIŞ'a ji El Qadî veqetiya êrîşî Mûsil û Şingalê kir, hemû çekên giran di Dêrezorê re derbasî Reqa kir, li wir jî ç qas çekên giran hebe stand û berê xwe da Kobanê (2014).

Bi şerê DAIŞ û Hêzên Apoît re, hîn nû DYE û Qraliyeta Yekgirtî fam kirin ku Apoîst ne hêzek wekîl a Mosqova û Îranê ye. CIA û MI6 di warê naskirina Apoîstan de pûş kutan. Dema partiyên çepgir ên wekîlên KGB'ê di 1978-81 êrîşî PKK'ê kirin diviya fam bikirina, ew jî nebû dema Hizbilaha Kurd a wekîlê Îranê bi hezaran Apoîst li Bakur şehîd kirin (1990-1995) diviya fam bikirina. Ew jî nebû, dema Pûtîn li dijî Serokê PKK'ê A. Öcalan bi wan re bazar kir (1998), diviya fam bikirina.

Lê Pentagonê di Şerê Kobanê de dît ku yên şer dikin di rastiya xwe de wekîlê Îranê û Apoîst in. Di dema Berxwedana Kobanê de pêwendiyên rast ên Pentagon û Apoîstan çêbûn û hîn nû ferqa Apoîzmê û Sosyalîzmê fam kirin.

**Ferqa Apoîzmê û Sosyalîzmê**

- Sosyalîzm dedoktrîner e, Apoîzm doktrîner e.
- Sosyalîzm dîktatoriya proleterya diparêze, Apoîzm her cure dîktatoriyê red dike.
- Sosyalîzm ji bo jinê ne xwedî bernameyekê ye, Apoîzm qada ku jin xwe serbixwe birêxistin bike jê re dihêle.
- Sosyalîzm Pîvana Hêzan zelal nake, otorîteya mûtlaq a Partiya Qomunîst e, Apoîzm Pîvana Hêzan diparêze; serxwebûna Yasadanan, Darazî û Rêveberiyê diparêze.
- Sosyalîzm azadiya derbirînê wekî êrîşeke dij Sosyalîzmê û çekek Qapîtalîzmê dinirxîne, Apoîzm azadiya derbirînê diparêze û wekî bingeha demoqrasiyê dibîne.
- Sosyalîzm azadiya şexs ji bo sîstemê wekî xetere dibîne, Apoîzm azadiya şexs diparêze û dinirxîne ku şexs ne azad be, jin jî wekî kes nikare di rastiya xwe de azad be.
- Apoîzm azadiya çapemeniyê diparêze, lê Sosyalîzma ku hatiye ceribandin li hemû welatan qadek azad ji çapemeniyê re nehiştiye.
- Apoîzm dibêje pergalek ji bo bijî, divê berî her tiştî demoqratîk be.

Têkiliya navbera Turkî û Ûrisya çi qasî xurtir bûbe û Erdoğan çi qasî bûbe hakimê Turkî, Cîhana Rojava jî ew qasî nêzîkî Kurdan bûye û ji Turkî bi dûr ketiye.

Di Şerê Kobanê de Pentagonê dît ku Apoîst û wekîlê Cîhana Rojhilat DAIŞ şer dikin û biryar da destekê bide Hêzên Apoîst.

Her ku Cîhana Rojava li dijî dagirkeriya Kurdistanê derkeve û mafên Kurdan ê netewî û mirovî biparêze jî dê navbera wan û Turkî biqete, dê ji hev bi dûr bikevin, Turkî dê bi Ûrisya, Îran, Sûrî, Îraq, Çîn û Qoreya Bakur re pirtir gavên siyasî, leşkerî û aborî biavêje. Li Rojhilata Navîn ji bilî Hêzên Apoîst hêzek bikaribe li dijî vê Turkiyê raweste tune.

Cîhana Rojava ji bo hemû qadroyên mîsyoner ên îstixbarata Ûrisya ku wekî çepgir û Sosyalîst dixuyin vala derkevin, destekek bê bazar, bê qeyd û şert bide Gelê Kurd û Tevgera Apoîst. Ev yek dê pirtir bibe sedema Bloqa Rojhilat bê pîvan êrîşî Tevgera Apoîst bike, lê îro ji xwe hemû teknolojiya Turkî li hember Kurdan bi kar tîne, bi vê someyê ye.

**Çavkanî**


1. "The SIPRI Military Expenditure Database". Milexdata.sipri.org. 23 https://web.archive.org/web/20160123190846/http://milexdata.sipri.org/
2. Erlanger, Steven (26 Mart 2014). "Europe Begins to Rethink Cuts to Military Spending". nytimes.com.
3. Nexşe û Xebatên Dr. Michael Izady https://www.amidakurd.net/ku/nuce/nexşe_û_xebatên_dr_michael_izady